Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1003 | 9-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Ji bo ajalan li warekî digere

**Hunermend Es Devlîn dibêje, peywendiya xebata wê bi malê re heye, yanî bi wî mekanê mirov şên dikin. Ew vê weke çandeke dibîne û hewl dide guhdariya bajêr bike û wî hîs bike. Ji bo xebat xwe dibêje, erê, hin tiştan hînî insanan dike, û wekî din wan vedixwîne ku bîra hin tiştan jî bibin.**

Hunermend Es Devlîn, bi muzîk û ronahiyê, peykerên gelemperî ango giştî çêdike û bi saya muzîk û ronahiyê zimanekî hunerî ji xwe re afirandiye. Her wiha ji teknolojiyê jî sûdê werdigire û ji bo karên xwe bi kar tîne. Bi van peykerên xwe yên ku li meydanên giştî nîşan dide, tê nîşandan û li hember dêrê disekine. Wê înstalasyona xwe bi aweyekî wisa sêwirandiye ku meriv dikarin bikevin hundirê wê jî. Di nav wêneyên ku xêz kirine de gelek kêzik, çûk, masî, mar û cûreyên din yên heywanan hene.



### Stranek ji bo hewyanên tinebûyî

Xebata Es Devlîn dişibe qubeyekê. Jixwe, ew jî dibêje, “Li gorî min qub dihate maneya xanî jî.” Û derbarê karê we de wiha derdibire, “Ev xebat girêdanekê bi mala me re ango xaniyê em lê dijîn çêdike. Divê em weke çandekê bibînin vî tiştî û karibin li bajarê xwe guhdarî bikin dixwaze perspektîfa mirovahiyê ya hezarê salan a ku hatiye guhertin nîşanî xelkê bide. Yanî ew bi van peykerên xwe li rabuhiriyê difikire û derbarê siberojê de jî dike ku meriv bifikirin. Çaxê meriv li peykerên wê dinihêre ne mumkin e ku meriv nebe perçeyekî karê wê, ew naxwaze meriv li derveyî peykerên wê bimînin û wan jî bi awayekî tevlî karê xwe dike. Ji lewma, heya jê tê peykerên xwe bi awayekî gelemperî nîşanî civakê dide û li derveyî salonan difikire. Her wiha bi van karên xwe merivan dide fikirandin jî.

Es Devlîn bi xebata xwe ya dawî ya bi navê “Come Home Again” (Dîsa vegere malê) li ser xwezayê û cihê insanan yê di nav vê xwezayê de hiziriya, hûr kolaya û dixwaze xelk jî li ser vê yekê bifikire. Wê bi riya vî peykerî, bi destan wêneyê 243 cûre heywanab xêz kiriye. Heywanên ku xêz kirine axlebê wan yên ku li ber nemanê ne, yanî mesela wan a man û nemanê heye. Wê ji ronahiya Dêra St. Paul a Londonê îlham girtiye û heman ronahiyê ji bo peykerê xwe jî bi cih kiriye. Jixwe, peykêrê ku çêkiriye jî li Tate Modern Garden û her wiha hîs bikin. Ev xebata min jî li gel ku hin tiştan fêrî insanan dike, wekî din wan vedixwîne ku bîra hin tiştan jî bibin. Ev xebata min stranek e, ji bo wan heywanan e ku li ber nemanê ne, meseleya wan a man û nemanê heye û hindik maye tine bibin.”

### Ji bo heywanan li warekî digere

Her şev komek muzîkjen ango koroyek diçe di hundirê peykerê Es Devlîn de stranan dibêje. Bi vî awayî meriv li dengê çûkan, şevşevok û kêzikan guhdarî dikin. Ji lewma ev deng hemû bi wêneyên Es Devlîn ku wê yek bi yek, bi qelemê xêz kirine, dibin yek û li bajêr dengekî bêhempa olan dide. Es Devlîn ji bo van heywanên li ber nemanê, li warekî digere da ku tê de bisitirin. Kesên ku diçin serdana peykerê wê jî vê daxwaz û armanca wê baş dibînin û hîs dikin. Ew bi van xêzên xwe dixwaze heywanan bi xelkê bide naskirin jî û bîne bîra wan ku ev heywan li ber nemanê ne.

***Ozgurpolitika***

# Hewldanek din ya ji bo valekirina Şengalê: Benzîn û mazotê nadin

**Hikumeta Iraqê bi destê îstîxbaratê ambargoya benzîn û mazotê daniye ser Şengalê. Gef li bazirganan jî dixwe ku kes benzînê nefiroşin Şengalê. Xelkê Şengalê bang li Iraqê kir ku ambargoyê rake.**



Ji bo valekirina Şengalê, dewleta Tirk PDK û Iraq serî li her rê û rêbazê dide. Li rexa êrişan, rêgiriya vegera penaberan û gefan, vê carê ambargoya benzînê xistine ser Şengalê. Piştî biryara îstîxbarata Iraq û ewlekariya Nîştimanî ya Iraqê, firotina mazot, benzîn û gazê ji bo Şengalê hatiye qedexekirin.

Ji destpêka werza havîna 2022’an ve, krîza benzîn, mazot û gazê heye. Demeke Hikumeta Kazimî bi destê îstîxbaratê ambargoya benzînê daniye ser Şengalê. Li Şengalê hemû benzînxaneyên taybet hatine girtin, gef li bazirganan hatiye xwarin ku mazot, benzîn û gazê ne firoşin Şengalê. Bi vê yekê dixwazin xelkê Şengalê koçber bibe û Şengalê vale bikin. Lê tevî hemû astengî, ambargo û rêgiriyan, Şaredariyên Şengalê kar û xebata xwe dimeşîne. Tevî astengiyan şaredarî, jenarator, tankên avê û wesayîtên gelaş ji bo xizmeta xelkê Şengalê dide karanîn.

Endamê şaredariya Şengalê Berekat Qasim li ser ambargoya benzînê ji Rojnews re axivî. Berekat got ku carna ji ber nebûna mazot û benzînê, wesayîtên şaredariyê nikarin kar bikin, ger benzîn nebe tankên avê jî radiwestin. Berekat dibêje; “Ji ber ku wesayîtên şaredariyê kar nakin, carna li kolanan gelaş kom dibe, ev ji bo tenduristiyê ne başe. Ambargo rê li karê me jî digre, em bang li hikumeta Iraqê dikin vê ambargoya ser Şengalê rabike.”

Şêniyê navçeya Xanesorê Kutî Şengalî jî li li ber jenaratora taxê disekine, Şengalî jî bang li hikumeta Iraqê kir da ku ambargoyê rake; “Îstîxbaratê biryar da ku êdî mazot neyê dayîn, ev ambargoya



ser benzînê bandorek nerênî li ser me dike. Tevî hemû gefan jî emê karê xwe bimeşînin.” ***ROJNEWS***

# Rêveberiya Xweser Nexweşxaneya Gel a Şedadê vekir

**Desteya Tenduristî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriye Nexweşxaneya Gel a Şedadê vekir.**

Şêniyên herêma başûr ê Hesekê yê Bakur û Rojhilatê Sûriye, nûnerên Desteya Tenduristî ya Rêveberiya Xweser, Meclisa Rêvber a Herêma Cizîrê, saziyên sivîl, leşkerî û saziyên civakî tev li merasîmê vekirina Nexweşxaneya Gel a Şedadê bûn.

Hevserokê Meclisa Rêvber a Rêveberiya Xweser a Herêma Cizîrê Telat Yunis axivî û vekirina nexweşxaneyê li şêniyan pîroz kir. Her wiha anî ziman ku Rêveberiya Xweser di van şert û mercên êrişên dewleta Tirk a dagirker û ambargoya li ser herêmê de gaveke pir girîng avêt. Talet Yunis eşkere kir ku lêçûna giştî ya nexweşxaneyê gihaşt milyonek û nîv û 14 hezar dolar.

Rêveberê Nexweşxaneya Gel a Şedadê Husam El Elî diyar kir ku Nexweşxaneya Gel a Şedadê yekemîn nexweşxaneya giştî li başûrê Hesekê ye, xizmeta derdora 50 hezar malbat ji gund û bajarokên girêdayî Şedadê, Kebdan, Dişêşe, Mergda û Ebû Fas




û hwd dike

El Elî anî ziman ku niha tenê 4 beş (Destwerdana lezgîn, taqîgeh, kilînîkên bijîşkî û jidayikbûna xwezayî ) hatin vekirin û di demên pêş de dê beşên din werin vekirin. El Elî bang li rêxistinên navneteweyî kir ku divê destekê bidin nexweşxaneyê da ku beşên din vekin, ji ber ku hewcedariya herêmê pê heye.

8 bijîşkên giştî û 6 bijîşkên pispor û kadroyên hemşîretî di nexweşxaneyê de kar dikin, her wiha du taqîgeh û du ambulans hene. Xebatên amadekirina nexweşxaneyê derdora salekê dewam kir.

Hêjayî gotinê ku çeteyên DAIŞ’ê dema ku gundewarên başûr ê Hesekê sala 2014’an dagir kiribû, nexweşxane kiribûn baregeh, ji ber vê yekê jî ji sedî 90 nexweşxaneyê hatibû rûxandin -***ANHA***

Sudoku:Pirs13

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | 8 | 5 | | 1 | |
| | | | 3 | | 4 | | | |
| 6 | 4 | 8 | | | | | 7 | |
| 9 | | | 2 | | 1 | | | 8 |
| 8 | 5 | | | | | | 6 | 2 |
| 3 | | | 5 | | 8 | | | 1 |
| | 1 | | | | | 9 | 3 | 6 |
| | | | 4 | | 6 | | | |
| | 3 | | 9 | 1 | | | | |

Sudoku: Bersiv 12

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 3 | 5 | 4 | 6 | 7 | 8 | 1 | 2 |
| 8 | 4 | 2 | 9 | 5 | 1 | 7 | 6 | 3 |
| 6 | 1 | 7 | 2 | 3 | 8 | 9 | 5 | 4 |
| 1 | 5 | 4 | 7 | 2 | 9 | 3 | 8 | 6 |
| 3 | 2 | 9 | 8 | 1 | 6 | 4 | 7 | 5 |
| 7 | 6 | 8 | 3 | 4 | 5 | 2 | 9 | 1 |
| 4 | 7 | 1 | 5 | 8 | 3 | 6 | 2 | 9 |
| 2 | 8 | 6 | 1 | 9 | 4 | 5 | 3 | 7 |
| 5 | 9 | 3 | 6 | 7 | 2 | 1 | 4 | 8 |

## Têkoşera li dijî komplogerên dîrokê



Nagîhan Akarsel bi aqilmendî û lêgerîna xwe ya heqîqetê, li hemberî komplogerên dîrokê, desthilatdariya mêr ya qirker û dagirkeran her tim bûye şervana pîroziyê.***R-2***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1003 | 9-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# ‘JIN JIYAN AZADÎ’ WÊ BIBE DAWIYA KOMPLOGERAN’

Komploya Navneteweyî ya 9’ê Cotmeha 1998’an ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocelan dikeve sala xwe ya 25’an de. Gelê kurd û yên azadixwaz ev 24 salin li dijî komployê tekoşîn dikin û bi tekoşîna xwe dengê xwe gihandine her derê cîhanê. Bêdengiya navneteweyî çiqas bi israr be jî, bi pêşengiya jina kurd teybet bi serhildanên ‘Jin Jiyan Azadî’yê’ sîstema koplogeran hejand û xistin nava pêxirtengiyekê ku nikarin ji nav derkevin.




## Koçbera Serê Kaniyê: Em xaka xwe ji dijmin re nahêlin



Li ser salvegera 3’yan ya dagîrkirina bajarê Serê Kaniyê koçbera bi navê Meysa Harûn da zanîn ku rojbiroj hêviya wan ya vegera bajarê wan mezin dibe û got, Serê Kaniyê xaka me ye, em xaka xwe ji dijmin re nahêlin. ***R-5***

## Ehmed Gulo: Wê 2023`yan sala azadiya Rêber Abdullah Ocalan be



Di salvegera 24`an ji komploya li ser Rêberê gelê Kurd Abdullah Oclan, welatparêz Ehmed Gulo da zanîn ku wê bi azadiya Rêber Apo her kes azad bibe, bi taybet gelê Kurd wê xewin û xeyalên xwe bi cî bîne.***R-4***


Idrîs Henan
Kî Bi Ser Ket Û Kî Bi Bin Ket?.....
R-5


Hafiz Ahmet Turhalli
Desthilat fitna nava .....
R-6


Ahmed Aktaş
Êrîşa dijî Jinê û çima Silêmaniyê?....
R-4

# Têkoşera li dijî komplogerên dîrokê

Bi aqilmendî û lêgerîna xwe ya heqîqetê, li hemberî komplogerên dîrokê, desthilatdariya mêr ya qirker û dagirkeran her tim bûye şervana pîroziyê.

**Zozan Sîma**

Nagîhan Akarsel di sala 1976'an de li bajarokê Golyazê ya navçeya Cîhanbeylî li bajarê Konyayê ji dayîk bû. Navê gund bi kurdî Xelîkan e. Gundê Kurdan e. Gelê wir ji xwe re dibêjin Kurmanc. Ew tefandina agir piştî hilatina rojê guneh dibînin û agir bi avê natefînin. Nagihan li ser çavkaniya van kevneşopiyan gelek lêkolîn dike. Her çiqas gund gundekî Hanefî ye jî, Nagihan têkiliya bingehê şêneyên gundê xwe bi Êzdayetî û Elewîtiyê ve girê dide û şêpên gundê xwe diglhîne herêma Meletî-Dêrsimê. Hezkirina xwe ya ji Dêrsim û Şengalê re jî bi vê yekê ve girê dide.

**Şehîd Nagîhan bi çanda xwe ve pir girêdayî bû**

Zîlan zarokatiya xweli gundê xwe kir. Gundê wê ne gundekî avî ye û gelek zeviyên genim hene. Lewra li cem wan, genim pir bi nirx e. Nagihan tama bîranînên xwe yên zarokatiyê ji bîr nekiribûn, kêliyên ku zarokên gund ji bo ku bêhna axa bi baranê şil bûyî bigrin, bi lingên tazî dilîstin û diçûn nava genim, her tim di bîra wê de bûn.

Hê ji zarokatiya xwe ve çîrokên jinan dişopîne. Têkiliya xwe bi bavê xwe re li ser hîmê hevaltiyê pêş dixe. Qasî ku bi çanda xwe ve girêdayî ew qas jî li hember hişmendiya baviksalarî jî xwedî seknekê bi israr e.

**Şehîd Nagîhan berê xwe dide riya têkoşîn û heqîqetê**

Dibistana seretayî, navîn û amadeyî li gundê xwe dixwîne. Di dibistanê de pir jîr e. Dema derbasî xwandina zanîngehê dibe, ji gundê xwe derdikeve. Li Zanîngeha Gazî ya Enqereyê beşê Ragihandinê dixwîne. Li zanîngehê di nava xebatên Yekêtiya Ciwanên Kurdistanê (YCK) cih digire. Rûkenî û lêgerînên wê wek roj û ax hev temam dikirin. Di despêka zanîngehê de, xwe ji sarbûn û materyalîzma jiyana bajêr dûr dixe û berê xwe dide cihên ku jiyana komînal û hevaltî lê heye. Ev lêgerîn wê di destpêkirina xebatên YCK'ê de jî bi bandor in. Ji xwendina rojnamegeriyê hez dike, lê qet nafikire ku di nava sîstema heyî de xwedî cihekî bibe û berê xwe dide rêya têkoşînê. Dema ku têkoşîna gelê xwe nas dike, ji Xelîkan ber bi Kurdistanê û ji Kurdistanê ber bi gerdûnê ve diherike. Hezkirina welat bi kûrahî dijî. Ji ber vê yekê jî têgihiştin û hîskirina rastiya Rêber Apo di kesayeta xwe de ava dike.

**Şehîd Nagîhan xebatên jinolojî pêş xist**

Di salên 2001-2007'an de bi hinceta 'xebatên siyasî li zanîngehan dike', hate girtin. Piştî ku ji girtîgehê derket, di navbera salên 2008-2014'an de li Ajansa Dîcleyê edîtorî û nûçegîhaniyê dike. Di vê pêvajoyê de, li ser azadiya jinê lêkolinên xwe kûr dike. Pişt re di damezrandina yekemîn ajansa jinan ya JINHA de cih digire. Di pêşxistina rojnamegeriya jinên Kurd de kedkar, mamoste, heval û rêheval bû. Derdorê xwe hemêz û ava dikir. Tenê bi Kurdistanê re sînordar namîne, bi jinên ji pêkhateyên cuda re jî têkilî û dostaniyê pêş dixe.



Xebata Jineolojiyê ya ku Rêber Apo pir girîngiyê didê, di asta herî jor de hem di warê akademîk û hem jî di aliyê sazî û dezgehan de pêş dixe û dimeşîne. Di despêka pêvajoya sazbûna Jineolojiyê de, beşdarî xebatên Akademiya Jineolojiyê dibe. Di pêvajoya damezrandina kovara Jîneolojiyê de gelekî dixebite. Ew endamê desteya weşanê ya kovarê ye û bi gotarên xwe wê dewlemed dike. Ji bo ku kovara Jîneolojiyê bibe platforma azadiya jinê, wê tu carî dest ji vekirina deriyên nû berneda.

**Evîndara çanda Hewreman û çanda berxwedaniya jina Rojhilatê**

Li gelek deverên Bakur, Başur û Rojavayê Kurdistanê xebatên lêkolîn û perwerdeyê dike. Bi hezaran mirovan perwerde dike û di gelek rojname û kovaran de dinivîse. Deverên diçe bi taybetî ji bo ciwanan dibe navendeke balkêş. Ew zarokan, dayîk jî wê hemêz dikin. Xebata xwe ya civaknasiyê ya li Efrîn û Şengalê, piştî sala 2018'an li cihên cûda didomîne. Weke keseke evîndara çanda Hewreman û çanda berxwedaniya jina Rojhilatê, lêkolînên xwe yên di vî warî de didomîne, lê ji ber ku nikare derbasî Rojhilatê Kurdistanê bibe her tim aliyekê xwe kêm dibîne.

Ji sala 2019'an heta roja şehadeta xwe, ji bo pêşxistina xebatên jîneolojiyê li herêma Başurê Kurdistanê bêwestan, xebat kir. Tevî ku nû hewl dide fêrî zaravayê soranî bibe jî, li herêma başurê Kurdistanê de bi dehan perwerde, kurs û semîneran li ser jineolojiyê dide. Bi ciwanan re kampên Jineolojiyê organîze dike.

**Tu carî hêviya xwe winda nekir**

Di van 2 sal in dawî de jî, ji bo ku lêkolinên jinên Kurdistanî yên li ser nirx û çanda devokî berhev bike, bi kelecaneke mezin dest bi xebata rêxistineke ku pêşengiya ronîkirina jinan ava bike, dike . Ji bo vê jî bi sebir, weke ku bi derziyê bîrekê dikole, ji bo avakirina Pirtûkxane, Arşîv û Navenda Lêkolînê ya Jinên Kurd xebitî. Tevî hemû astengî û zehmetiyan jî li ser baweriyê ku şoreşa Başûr wê bibe şoreşa jinê meşiya û tu carî jî ev hêviya xwe winda nekir. Ji derveyî van karan hemûyan jî, hesreta wê ya herî mezin bi dawîkirina romana xwe ya pêvajoya hevdîtina bi rastiya Rêber Apo re bû. Lê mixabin ne giha vê hesreta xwe pêk bîne.

**Li hemberî komplogerên dîrokê bûye şervana pîroziyê**

Nagîhan di her kêliya jiyana xwe de, aqilmendiya dîroka jinê derxist holê. Ev aqil, aqilekî ku desthilatdariya mêr red dike, cewhera jin û civakê diparêze û hişmendiya ekolojîk bi rûmet dike ye. Bi vê aqilmendî û lêgerîna xwe ya heqîqetê, li hemberî komplogerên dîrokê, desthilatdariya mêr ya qirker û dagirkeran her tim bûye şervana pîroziyê.

Dê qêrîna takoşina wê, roj bi roj mezin bibe û rastiya JIN JIYAN AZADI'yê jî wê li her derê belav bibe. Ev êrîş, êrîşa li dijî bilindkirina têkoşîna jinê û helwesta azadiyê ye; Ev tolhildana li dijî jinên fedayiyên azadiyê ye. Nagihan ronahî, hişmendî, hêvî û bedewiya jinan bû. Xwedî li wê derketin, parastina bedewî, başî û azadiyê ye. Enerjî û evîna jiyana Nagihan wê bibe rênasîna me hemûyan. Em ê li pey xeyal û hesretên wê bin. Em têkoşîna wî bêdawî nahêlin.

# 'Em her demê soza tolhildana pêşengên xwe nû dikin'

**Zana Roj/Şheba**

**Jinên ciwan yên herêma Efrînê diyar kirin ku armanca êrişên ser jinên pêşeng, têkbirina îradiya jinên azadîxwaz e û gotin, tu kes nikare vîn û hêza jinê pûç bike. Herwiha dan xuyakirin ewê tola şehîdên azadiyê rakin û hisabê giran ji dagîrkeran bixwazin.**

Dewleta Tirk ya dagîrker bi hemû rêbazên xwe yê bêexalaq, siyaseta hilweşandin û têkbirina îradeya jinê dimeşîne. Dagîrkeriya Tirk bi alîkariya sîxur û xayînan, bi balafirên bêmirov jinên kedkar û pêşengên şoreşa jinê dike hedef. Di 27 Îlonê de dewleta Tirk ya dagîrker Şehîd Zeyneb Saroxan ku yek ji pêşengên jinên xebatkar yên ku ji bo azadiya jinê têdikoşiyan, bi balafieke bêmirov kir armanc û şhîd xist. Herwiha di 4 cotmehê de têkoşera Kurd Nagîhan li ser destê xayîna li bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê hat şehîdxistin. Jinên ciwan yên herêma Efrînê, êrişên dagîrkeriya Tirk yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê û hedefgirtina jinên pêşeng û têkoşer yên Kurd şermezar kirin û diyar kirin ku wê tu kes nikarbe îradeya jinê têk bibe. Endama Meclîsa Yekîtiya Jinên Ciwan ya herêma Efrînê Dunya Bekir diyar kir ku armanca dewleta Tirk ya dagîrker ji hedefgirtina Jinên pêşeng yên Şoreşa Rojava, Têkbirina hêza jinê ye û got: "Di tevayiya cîhanê de, jin bi awaeyekî dijwar ji her alî ve tê hedefgirtin. Hêzên hegemon bi gîştî dixwazin jin ji her aliyî ve dorpêç bikin, îradeya wê têk bibin, ji bo ku jin tu carî nikaribe serî rake. Di demên dawî de, bi taybetî li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, dewleta Tirk Ya dagîrker jinên têkoşer û parêzvanên xeta azadiya jin, dikin hedef. Dagîrkeriya Tirk bi hedefgirtina pêşengên mîna Şehîd Sosin Bîrhat, Şehîd Jıyan Tolhildan û Şehîd Roj, Şehîd Zeyneb Saroxan, dixwaze hêza jinê lawaz bike."

**'Şehîd Zeyneb Saroxan pêşenga jina azadîxwaz bû'**

mînaka jina Dunya da xuyakirin wê dewleta Tirk ya dagirker bi hedefgirtina jinên pêşeng yên Şoreşa Rojava, nikaribe şoreşa jinê têk bibe û wiha got: "Şehîd Zeyneb Saroxan yek ji damezrênerên şoreşa Rojava



ye, di xeta bîrdoziya jin û perwerdekirina jin de kedeke pir mezin daye. Şehîdxistina her rêhevalek me, hêrsa me ya li dijî dagîrkeriya Tirk zêdetir dike û girêdana me ya bi xeta azadiya jinê re xurtir dike."

**'Em hre demê soza tolhildana pêşengên xwe nû dikin'**

Endama Yekîtiya Jinên Ciwan Zeyneb Xoce jî hedefgirtina jinên pêşeng



şermezar kir û wiha got: "Dijmin bi siyaseta xwe ya hedefgirtina jinan, dixwaze jinan bê hêvî bihêle, herwiha dixwaze îradiya jinan pûç bike.Lê ewê bi vê siyasetê nikarbin bigihîn armancên xwe. Bi saya fikrê Rêber Apo, asta jin ya xwenaskirinê gihîştiye lûtkeyê. Em hre demê soza tolhildana pêşengên xwe nû dikin û bi biryardarî û rihê têkoşînê emê ji bo azadiya jin têbikoşin"



# Bi dengbêjiyê hunera xwe diparêzin

Jinên ku cihê xwe di nav koma stranan ya şehîd Mizgîn de digrin hest û helwestên xwe wiha anîn ziman: "Koma Şehîd Mizgîn derfetek ji me re vekir ku em xwedî li dengbêjiyê derkevin û çanda stranan biparêzin."

Stran, dengbêjî û lorîk bi dengê jinan tên nasîn. Dayikan dema ku ji zarokên xwe hez dikirin bi riya vegotina lorîkan çanda stranan bi pêş dixistin lê di nava civakê de bi hinceta şermê nedihiştin ku jin di warê hunerî de xwe bi pêş bixin û xwedî li meraqên xwe derkevin bi taybetî di warê dengbêjiyê de. Bi derketina çirûska şoreşa Rojava û belavbûna wê di nava civakê de derfet li pêşiya jinan vebû ku xeyalên xwe yên di dilê wan de bûbûn hesret pêk bînin. Piştî avakirina navenda Çand û Hunerê û Hîlala Zêrîn jinan cihê xwe di nava komên hunerê de girtin. Koma Şehîd Mizgîn jî ya Hîlala Zêrîn a ku stranên kevnşopî yên herêma Efrînê pêşkêş dike hat avakirin û niha 8 jin bi temenê xwe yê mezin tê de cih digirin.

**'Em şopdarên şehîdên ku ji bo hunera Kurdî canê xwe feda kirine ne'**



Rêvebera koma Şehîd Mizgîn Nebîha Mihemed behsa kar û xebatên xwe yên komê kir û wiha got: "Me di navenda Hîlala Zêrîn de koma Şehîd Mizgîn ava kir. Ez ji temenê 18 salî ve karê hunerê dikim. Niha jî bi çil saliya xwe ez karê xwe di nava şoreşê de didomînim. Destpêkê kom ji sê jinan pêk dihat lê bi demê re hejmar zêde bû, koma me berfireh bû. Yekem car em derketin ser dikê di şahiya 8'ê Adarê de bû wek jinên bi temen mezin derdikevin pêşberî gel û dengbêjiyê bikin ji bo me serkeftinek mezin bû. Şehîd mizgîn roleke mezin di xebatên hunerî de dilîst û bi dengê xwe yê xweş gelek bandor li me kir, ji ber vê yekê me navê koma xwe kir koma Şehîd Mizgîn da ku em navê di nav hunerê de zindî bihêlin. Gelek caran jin bi riya stran û dengbêjiyê hest û êşên xwe tînin ziman. Em şopdarên şehîdên ku ji bo zindîkirina hunera Kurdî canê xwe fedakirine ne."

**'Jin bi lorîkên xwe peyaman didin civakê'**

Endama koma Şehîd Mizgîn Guneyî Mustafa ya 43 salî bal kişand ser xebata xwe ya di komê de û wiha got: "Ya ku derfet ji me re çêkir ku em bikaribin xeyalên xwe pêk bînin felsefeya Rêber Apo û şehîdên me bû. Her dayikek bi riya stranan êşên xwe vedibêje. Di demên berê de ji ber adet û kevnşopiyên civakî jin hatibûn xeniqandin û nikaribûn bi rehetî xwedî li meraqên xwe derkevin. Ji zarokatiya xwe ve min ji dengbêjiyê hez dikir lê derfet tunebû ku ez xwedî li meraqên xwe derbikevim. Bi saya şoreşa Rojava derfet ji me re çêbû ku em xewnên xwe pêk bînin. Her jinek bi deng û lorîkên xwe peyamek ji civakê re radigihîne. Em ê çand û hebûna xwe ji qirkirinê biparêzin. Banga me ji jinan re ew e ku çanda xwe biparêzin."

'Em stranên şoreşgerî û folklorî dibêjin'

Hêvîn Mihemed a ku cihê xwe di koma Şehîd Mizgîn de girtiye hestên xwe wiha anî ziman: "Em Şehîd Mizgîn bi bîr tînin û şopdarên xetê wê ne. Şehîd Mizgîn cihê xwe di warê hunerî û leşkerî de girtibû ev jî hêzek dida jinan. Dayikên ku cihê xwe di komê stranan de digrin eşqa wan ji dengbêjiyê re heye. Di bin navê şermê de jin ji meraq û xewnên xwe hatibûn mehrûmkirin. Bi derketina Şoreşa Rojava re şerma di vî warê de di nav civakê de hatibû belavkirin ji holê hat rakirin û êdî jin bi azadî dikarin tevbigerin û cihê xwe di nav hunerê de bigrin. Piranî stranên ku em dibêjin şoreşgerî û folklorî ne. Bi deng û stranên xwe em bersivê didin dijmin û tu carî nahêlin çanda me bidin qirkirin."

***JÎNHA***

# Mîhrîcana Arîn, Bisk û Zilfên Aştiyê hat lidarxistin

**Duyemîn Mîhrîcana Arîn Bisk û Zilfên Aştiyê, bi şanoya "Hêrîn" ya bajarê Reqayê didome.**

Duyemîn Mîhrîcana Arîn Bisk û Zilfên Aştiyê Ye, bi diruşmeya "Li vir hin hêvî hene, divê bên pêşkêş kirin" bi dewreya xwe a duyemîn di 5`ê Cotmehê de bi wesîleya 8`emîn salvegera şervana YPJ`ê a fedayî Arîn Mîrkan ku destpê kiribû, didome.

Bi sedan ji şêniyên kantona




Kobanê bi coş û meraqeke mezin îro berê xwe dan navenda Çand û Hûnera Baqî Xido da ku li xebatên mîhrîcana şano ya Arîn Bisk û Zilfên Aştiyê Ye binêrin.

Têkildarî şano û bi giştî rewşa mîhrîcanê, nêrîn û hestên beşdarvanan hatin girtin.

**'Mîhrîcan xwedî wate û girîngiyeke mezin e'**

Hevseroka Desteya Çandê ya herêma Firatê û endama komîteya amedekar ya mîhrîcanê Rodîn Yusif nirxandinên xwe wina anî ziman: "Ev demek e dirêj e em amedekariyên festîvalê dikin, ji ber vê em ê rû bi rûyê şanoyên dewlemend û bi wate bin. Pêwistiya me bi çalakiyên çandî û hûnerî heye ku mirov bikaribe rola xwe di nava civakê de bilîze. Şehîd Arîn yek ji sembolên berxwedana Kobanê ye ku heta dawiyê jî li dijî terora DAIŞ`ê şer kir. Ji ber vê ev mîhrîcan ji bo bîranîna wê û tevahî cangoriyên şerê Kobanê ye. Şano eynîka civakê ye, ji ber vê çalakiyên bi vî rengî çand û kiltûra civakê jî diparêze. Di van 10 rojên festîvalê de em ê rastî gelek ziman, devok û çandên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê werin. Ji ber vê ev hestekî gelek xweş bi me re ava dike."

**'Mîhrîcanekê dewlemend û binirx e'**

Her wisa şanoger Leyla Ehmed ku ji temaşevanên mîhrîcanê ye, çavdêriyên xwe wiha bilêv kir: "Festîvala Arîn ya şanoyê di dewreya duyem birêve diçe. Me roja yekê şanoya Dara Jînê dît, me yekser hestên ku me di dema şerê Kobanê de jiyan kiribûn, dîsa jiyan kir. Di roja duyem ya mîhrîcanê de ji bajarê Reqayê şanoya bi navê "Hêrîn" hat pêkêş kirin. Ev şano bi rêbazeke profesyonel hatibû amedekirin, ev yek jî rengekî xweş da festîvalê. Li aliyekî din mirov girêdana gel ya bi şanogeriyê re dibîne, her kes bi coşeke mezin berê xwe didin navenda Çand û Hûnera Baqî Xido. Em serkeftinê ji hemû koman re dixwezin û em di wê baweriyê de ne ku em bigihêjin encamên gelek baş."

***JÎNHA***

# Her mal wê bibe dibistan

**Komeleya Lêkolînên Çand û Zimanên Mezopotamyayê (MED-DER), bi boneya Roja Mamosteyan a Cîhanê li avahiya xwe ya li navçeya Peyas a Amedê pîrozbahiyek li dar xist. Di pîrozbahiyê de rêveberiya MED-DER'ê kulîlk dan mamosteyan. Partiya Herêmên Demokratik (DBP), mamosteyên Kurdî û endamên MED-DER'ê tevlî pîrozbahiyê bûn.**



**'Deh wê bibin hezar û hezar bibin deh hezar'**

Paşê, hevserokê MED-DER'ê Rifat Ronî got, 5'ê Cotmehê Roja Mamosteyan a Cîhanê ye û lê ev sed sal in ku gelê Kurd ji perwerdehiya zimanê dayîkê bêpar e. Ronî di dewamê de wiha peyivî: "Ti derfet nehatiye dayîn ku hetanî îro mamosteyên Kurdî werin gihandin û hejmara wan zêde bibe. Ji destpêka Komara Tirkiyeyê hetanî niha ji bo ku perwerdehiya zimanê Tirkî bidin milyon û 500 hezar mamoste li ser kar in. Ji bo bi milyonan Kurdî heta niha ji bo gihandina mamosteyên Kurdî û ji bo avahiyên perwerdehiyê ji aliyê dewleta Tirkiyeyê ve ti gav nehatiye avêtin. Tevî vê rewşê û zext û zora li hember zimanê Kurdî jî ku dewleta Tirkiye dike, bi dehan mamosteyên me li vir in û ev deh dê bibin hezar, hezar dê bibin deh hezar û her maleke me dê bibe dibistan. Ez malavahiya tevahiya memosteyên ku em anînê vê demê dikim."

**'Mamostetiya zimanê Kurdî bi nirx e'**

Hevserokê DBP'a Amedê Hayrettîn Altûn jî axivî û da zanîn ku wî 25 salan mamostetiya zimanê Tirkî kiriye û sozek daye ku çiqas ji bo zimanê Tirkî xebitîbe, dê ji bo zimanê Kurdî jî herî kêm ewqasî bixebite. Altûn got, ew bejna xwe li ber dayikên Kurd, li ber jinên Kurd yên hetanî niha zarokên xwe bi zimanê xwe mezin kirine ditewîne: "Ji bo ku em bibin memûrê dewletê em şandin dibistanan. Di wan dibistanan de makîneya bişaftinê bi rêk û pêk kar dikirin. Saziyên ku li ser zimanê xwe xebatan dimeşînin, ez dizanim ku saziyên herî bi nirx ew in. Ji ber ku gava tu zimanekî biparêzî, tu neteweyekê diparêzî, tu civakekê diparêzî. Di cîhanê de mamoste wekî endezyarên jiyanê tên pênasekirin. Di cîhanê de tişta herî bi nirx mamostetiya zimanê Kurdî ye. Ji ber wê yekê, ez li hember mamosteyên me yên ku li ser Kurdî dixebitin û şopdariya ziman û çanda Kurdan dikin, bejna xwe ditewînim."

***Ozgurpolitika***

# ‘Tu caran me dagîrkirina bajarê xwe qebûl nekiriye û em qebûl nakin jî`

Têkildarê salvegera dagîrkirina bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî, Sead Remo diyar kir ku, dewleta tirk ya dagîrker ji bo zindîkirina Îmbiratoriya Osmanî, bi hezaran melbet koçber kirin, lê gel dest ji tekoşina rizgarkirina bajarên xwe bernada ye.

**Bêrîtan Çiya-Qamişlo**

**Deweleta Tirk ya dagîrker bi êrişa 9`ê Cotmeha 2019’an ya ser bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî, bi hezaran malbatan koçber kir. Şêneyên her du bajaran jî, ber êrişan neçar man ku dev ji mal û milkên xwe berdin û li kempan, bijîn.**



Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, piştî êrişên dagîrkeriya dewleta Tirk, bi hevkariya Heyva Sor ya Kurdî 24`ê Cotmeha 2019`an ji bo pêşwazîkirina 230 malbatî ku 16 hezar mirovên koçberên her du bajaran, li bajarokê Tiwêna yê 12 km li rojavayê bajarê Hesekê, Kampa Waşokanî vekir. Rêveberiyê ji bo perwerdeya zarokan jî bi hevkariya desteya perwerdeyê, destpêka avakirina kampê dibistanek ava kir, lê niha ji ber zêdebûna jimara xwendekaran, sê dibisatan li kampê hatine avakirin û 2 hezar û 344 xwendekar li van dibistanan dixwînin. Herwiha ji bo tenduristiyê jî Heyva Sor ya Kurdî nexweşxaneyek li kampê ava kir û ev nexweşxane bi şev û roj vekiriye.

**`Pêwîstiya Kampa Waşokanî bi alîkariyê heye`**

Li ser rewşa kampê û salvegera dagîrkirina bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî rêveberê Ofîsa Têkilyan ya Kampa Waşokanî Sead Remo ji rojnameya me re wiha axivî: “Ev 3 salin di ser dagîrkirinê re derbas dibe. 3 sal li ser berxwedana koçberan yên li kampê derbas dibe. Rewşa Kampa Waşokanî zehmet dibe, lewra heta niha dewletên navneteweyî îtîraf bi vê kampê nekiriine, da ku alîkariyê pêşkêş bikin. Çadirên kona ji destpêka avakirina wê ve ye, tirsa me ji çileye ku bi van neyên qedandin. Rêveberiya Xweser heta jê tê li gorî derfetên xwe yê heyî, alîkariyê pêşkêşî koçberan dike. Lê têrê nakê, çimkî em behsa bi hezarê mirova dikin.”

Sead da zanin ku, ji dema teqîna motorsikletê ya di 12`ê Îlona 2022 li Kampa Waşokanî rûdayî, ku di encamê de sê zarokan jiayana xwe ji dest dan, hêzên ewlekariyê ajotina motorsikletan di kampê



de qedexe kir û wiha got: “Ji bo çi kesê di hundirê kampê de bê kar û pêşeyî nemînin,ji temenê 18 salî û jor ve li ser karên pêşeyî tên perwerdekirin.

**‘Ji derveyî hêza me baweriya me bi ti hêza nayê’**

Rêveberê Ofîsa Têkilyan ya Kampa Waşokanî Sead Remo axaftina xw wiha bi dawê kir : “Daxwaza me û ya tevayiya koçberan rizgarkirina bajarê me ji dagîrkeran e. Baweriya me bi hêza me heye, emê heta dawiyê jî bi berxwedan û têkoşîna xwe piştgirya wan bikin û em dizanin ku ji derveyî hêzên me ti hêz nexwedî li me derdikevin, ne jî xaka me diparêzin û rizgar dikin. Em tu cara dagîrkirina bajarê xwe qebûl nakin.”

# Desteya Enerjî û Peywendiyan 3 gundên Şedadê ronî kirin

**Desteya Enerjî û Peywendiyan ya herêma Cizîrê piştî xebatên sererastkirinê yên li herêmên tijî mayîn, kehrebe li 3 gundên navçeya Şedadê vegand.**

Desteya Enerjî û Peywendiyan a herêma Cizîrê û Saziya Kehrebeyê ya Şedadê projeya sererastkirina tora kehrebeyê ji bo gundên “Kişkiş a bakur, Kişkiş a navîn û Kişkiş El Cibûr” yên li başûrê navçeya Şedadê ya kantona Hesekê dest pê kir.

Di dema serweriya çeteyan li herêmê tora kehrebeyê ji aliyê wan ve hatibû xirabkirin. Ji ber ku mayîn li wê herêmê pir bûn, xebatên werşeyên kehrebeyê rastî astengiyan dihatin û xebatên sererastkirinê dereng diman.

Di 17’ê Tîrmeha borî de û piştî vegera hejmareke mezin a şêniyên her sê gundan, karê çaksaziyê dest pê kir. Transên kehrebeyê û stûn ji bo kişandina kabloyan



hatin danîn.

Têkildarî mijarê, Hisên El Xelef ji şêniyên gundê Kişkiş El Cibûr got: “Ji ber şerên sala 2016’an gundên me wêran bûn û şebekeya kehrebeyê bi temamî hat xirabkirin.”

El Xelef wiha lê zêde kir: “Em spasiya hemû hewlên ku ji bo vegerandina kehrebê hatine kirin, dikin. Em bi dilgermî li gihandina kehrebeyê ne.”

Ji aliyê xwe ve hevseroka Saziya Kehrebeyê ya Şedadê Rîm El Reca ev agahî parve kirin: “Piştî xebateke berfireh ji aliyê hemû atolyeyên kar ve û hewldanên ji bo sererastkirina şebekeyên xirabûyî ku di encama şer de wêran bûne de, proje bi dawî hat.”

Rîm El Reca amaje bi vê yekê jî kir: “Bi qasî 3 mehan kar li ser projeyê dewam kir. Gelek astengî li pêşiya xebatê hebûn, ku ya herî girîng hebûna zêde ya mayinan bû. Bi qasî mehekê kar li ser rakirina mayînan hat kirin, lê îro me karî bi temamî projeyê biqedînin.”

Der barê hejmara sûdmendan de, Rîm El Reca wiha got: “Malbatên koçber piştî destpêkirina kar vegeriyan gundên xwe. Vê yekê jî hejmara beşdar û sûdmendan gihand zêdetirî 200 malbatan. Her ku diçe ev hejmar li ser asta sê gundan zêdetir dibe. Li her gundekî transek heye, kapasîteya wê 200 watt e û stûnên pêwîst bi temamî jê re hatine danîn.”

Rîm El Reca wiha dirêjî da axaftina xwe: “Em amadekariyan dikin ku projeyek bi vî rengî ji bo sê gundên din ên li xeta rojhilatê navçeyê jî dest pê bikin; gundê Celal, El Ilwa El Şerqiye û El Seniyûr.”

Hevseroka Saziya Kehrebeyê Rîm El Reca ji welatiyan xwest ku parastina transên kehrebeyê bikin da ku kehrebe bi awayekî berdewam bigihêje gundên wan.

***ANHA***



## Desthilat fitna nava misulmana ne

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Li dewleta Îranê ku dibêje ez komara Îslamî me, buyerên pir giran û ne ji rêzê diqewimin. Îran ev bi salane ku desthelatê bi navê ola Îslamê û mezhebê Şîa dide meşandin. Lê ne aşitî, ne azadî û ne wekhevî, di civaka Îranê peyda nebe. Berovajî wê kuştin, şer, pevçun, xizanî û nezanî pêş ketiye.

Fitneya me Misilmanan di pirsgirêka desthelatdarîyê de asê maye. Xwedê dibêje: ‘Fitne ji kuştina mirovan girantir û xirabtir e‘ (Albeqere 191).

Fitneya umeta Îslamê piştî wefata Pêxember silavên Xwedê lêbe dest pêkiriye. Cenazeya pêxemberê me hê li erdê bûye, buyerên ‘Seqîfê‘ yên ku ji bo desthelatdariyê pevçun û tevlîhevî çêdikirin, ji dîroka me misilmanan de destpêkiriye.

Roja ola Îslamê bi pirsgirêka desthelatê ve rûberû maye, pirsgirêkên me çiqas çûne girantir bûne. Dema di olê de pirsgirêk wekî desthelatan were armancgirtin, berê her tiştê ew ol ji naveroka xwe tê vala kirin û bawermendên wê olê hertim, rastî zilm û neheqiyê tên.

Pirtuka pîroz Qur’an dibêje: ‘Milk yê Xwedêye‘ yanî rêveberîya mutleq ya Xwedêye. Xwedê bê cûdahî dilovaniyê li hemû mirovan dike. Ji ber ku ol, bawerî, reng, çand, ziman û fikrên mirovan cudane, bi wan re danusandinan nake, wan bê dilovanî nahêle. Ew jiyanê dide, ger mirov bi xîret kar û tekoşina jiyana rast bike wê bikare mal, hizur û azadiyê jî bidest bixe. Xwedê li ser rûyê erdê ne ola kesî, ne rengê kesî, ne zimanê kesî wek pîvan nagre. Ji bo ku henek mirov guhdariya wî nakin, li hemberî wî derdikevin, wan li vê dinyayê ceza nake û behsa jiyanekî dîtir (axret) dike. Dibêje, eger hûn başbin û karê baş bikin, ezê we xelat bikim.

Lêbelê çima kesê bi navê ol û Xwedê tevdigerin, mirovan tengav dikin? Li gor zimanê wan, cudabûna bîr û baweriyên wan, mê û nêrbûna wan, dewlemendbûn û xizanbûna wan, rengê wan, cilûberg, çand û erkê wan, nêzî mirovan dibin û wan dabeş dikin. Gelo ev desthelatên ku bi navê Şîa an Suniyan kar dikin û hêjî desthelat di destê wan de ye, vê Qur’anê naxwînin? Belê dixwînin û pênasa wê jî bi zanebûn dikin. Beriya Îslamê çawa ku alîgirên olên dîn, ola heyî ji bo desthelatê xera kirin û ew xistin xizmeta destheltdaran, heman tişt heta jê xirabtir, bi ser Îslamê de jî anîne.

Desthelata Îranê dibêje, ’divê hûn ligor min, bifikirin, li gor min bixwin û vexwin, li gor min binivîsin, li gor mezheba min, zimanê min, çanda min tevbigerin, yan jî ezê we ceza bikim, bavêjim zîndanan’. Dibêjin, Îmamê me Masume bê gunhe, ew bêje çi divê wek wî em tevbigerin’. Sunnî dibêjin Xelîfeyê me sîya Xwedê ya li ser ruyê erdê ye. Bi gotinekî din Îmam û Xelîfe, ji Xwedê zêdetir xwedî desthelatin. Ev hişmendî û nêzikbûn di dîrokê de wek hişmendiya Fîron û Nemrutan, di Qur’ana pîrozde de tê pênasekirin. Di gotinê de van desthilatdaran jî behsa Xwedê dikirin, lê di rastiyê de Xwedê nêzê desthelata xwe nakin. Ji ber wî jî, ewqas zilm û zordariyê li ser mirovan dimeşînin. Ji bo laçikê dikarin Jinekî bikujin. Piştî zilma giran, pêkanîn û gel rabû ser piyan, îca dibêjin; ev leystoka Îsraîl û dûjminan e! Lê di rastiyê de, ewin yên bi desthilata xwe dijminahiya Xwedê û însanan dikin.



# HPG: 6 leşkerên Tirk yên dagirker hatin cezakirin

Hêzên Parastina Gel HPG’ê Ragehand ku di 7 çalakiyên gerîlayên azadiya Kurdistanê de 6 leşkerên Tirk ên dagirker ceza kirin. Herwiha da xuyakirin ku pergaleke kameraya mobese hatiye îmhakirin.

**Navenda nûçeyan**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê bi daxyaniyekê diyar kir ku Gerîlayên Azadiya Kurdistanê li ser xeta fedaî ya şehîdên nemir, li hemberî tevgera dagirker a artêşa Tirk a dagirker, berxwedaneke dîrokî dikin. HPG’ê da xuyakirin ku hêzên wan di şertên herî dijwar de şer dikin bêyî teredut diçin ser dagirkeran, derbên giran li dagirkeran dixin.



HPG’ê ragehand ku di 7 çalakiyên hêzên wan de 6 dagirker hatine cezakirin, dagirkerek jî hatiye birîndarkirin. Herwiha da zanîn ku di heman demê de pergaleke kameraya mobeseyê ku li ser wê mayîn hatibû danîn jî hatiye îmhakirin.

HPG’ê ragehand ku di 6’ê Cotmehê de saet di 10.00’an de li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê bi sabotajê li wan hatiye xistin û dagirkerek hatiye cezakirin. Herwiha diyar kir ku di 6’ê Cotmehê de saet di 13.00’an de li Qada Berxwedanê ya Sîdayê bidin, hêzên wan bi sabotajê li dagirkeran dane û 2 dagirker hatine cezakirin.

HPG’ê da xuyakirin ku di 6’ê Cotmehê de saet di 15.00’an de tîmên bi tevger pergala kamerayê ya mobeseyê ku li ser wê mayîn hatibû dayîn û li dora çeperên şer ên Şehîd Felat a Qada Berxwedanê ya Sîdayê, bi awayekî profesyonel îmha kirine.

HPDi 6’ê Cotmehê de dagirkeran dema ku hewl dane li dora çeperên şer ên Şehîd Xursî ya Qada Berxwedanê ya Sacayê pergala kamerayê bi cih bikin, tîmên me yên bi tevger ew xistine kontrolê. Saet di 18.00’an de bi taktîka sûîkastê û bi çekên ferdî li wan hate xistin. Li vir dagirkerek hate cezakirin û dagirkerek jî birîndar bûye.

HPG’ê diyar kir ku di 6’ê Cotmehê saet di 08:30’î de li Xakurkê, tîmên bi tevger ên YJA Starê bi çekên giran li dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Girê Şehîd Derwêş xistin. Herwiha ragehand ku 6’ê Cotmehê saet di 16:00 de li Xakurkê, tîmên me yên bi tevger bi çekên giran li dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Girê Şehîd Şahan xistin. Di encamê de 2 dagirker hatin cezakirin. Hêzên me her wiha bi çekên giran li dagirkeran xistin ên ku xwestin bi wesayitan dest li qada çalakiyê werdin.

# Jinên Tîrêjên Rojê: Li Geverê 4 polîs hatin cezakirin, 5 jî birîndar bûn

**Navenda Nûçeyan**

**Înîsiyatîfa Jinên Tîrêjên Rojê ragihand, ku li navçeya Geverê ya Colemêrgê li dijî polîsan çalakî lidar xistine. Hate ragihandin ku di encama çalakiyan de 4 polîs hatine cezakirin, 5 jî birîndar bûne.**



bi daxuyaniyekê ragihand ku di navbera 20’ê Îlonê û 3’ê Cotmehê de wan li dijî wesayit û qereqola polîsan çalakî lidar xistine.

Înîsiyatîfa Jinên Tîrêjên Rojê di daxuyaniyê de diyar kir ku yekîneyên wan ji bo ku çalakiya hevalên Şehîd Sara û Şehîd Rûken silav bikin, li Geverê di 20-24 û 30’ê Îlonê de çalakî lidar xistin.

Înîsiyatîfa Jinên Tîrêjên Rojê ragehand ku 20’ê Îlonê bi şev saet derdora 7-8’an de li sûkê bi fîşekên hewayî û bombeyên deng li hemberî mala polîsan çalakî hate lidarxistin.

Însiyatîfê da xuyakirin ku di 24’ê Îlonê li taxa Cûmhûriyetê ya Geverê bi şev saet di 11:30’î de li hemberî wesayitên zirxî û wesayitên polîsan ên sivîl ên li dewriyeyê digeriyan bi sabotajê çalakî hate lidarxistin. Wesayita polîsan a sivîl bi temamî îmha bû, 2 polîsên dewleta Tirk a dagirker ên tê de hatin cezakirin, yek jê giran 2 dagirker jî birîndar bûn.

Însiyatîfê da zanîn ku di 30’ê Îlonê bi şev saet di 00:00 de li taxa Orman a Geverê li hemberî qereqola polîsên dagirker ji du baskan ve bi bombeyên deng û molotofan çalakî hate lidarxistin. Dagirkerên ku tirs û panîk kete nava wan, heta sibehê li derdorê reşandin.

Înîsiyatîfê diyar kir ku li dijî komployа 9’ê Cotmehê ya li hemberî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 3’ê Cotmehê de li taxa Kişla ya Geverê li qereqola polîsan a li 75’an xistine û wiha got: “Saet di 20:00-21:00 de yekîneyên me li qereqola polîsan a 75’an xistin ku taxa me dagir kiriye. Ji du baskan ve bi bombeyên destan û yên deng çalakî hate lidarxistin. Piştî çalakiyê li hemberî polîsên tîmên taybet ên berê xwe dan taxa me, bi çekan çalakî hate kirin. Bi çekên ferdî li polîsên tîmên taybet hate xistin û demeke dirêj şer qewimî. Piştî vî şerî, bi qasî ku yekîneyên me tespît kriin 2 polîsên dagirker hatin cezakirin, 3 polîs jî birîndar bûn ku rewşa yekî ji wan giran e.”

Înîsiyatîfa Jinên Tîrêjên Rojê da dawiya daxuyaniya xwe de diyar kir ku yekîneyên wan piştî van çalakiyên wan yên serketî bi rengekî ewle gihîştin qadên xwe.

# RAJIN: Têkoşîna heqîqetê ji Gûrbeteliyan heta bi Nagîhanan her mezin dibe

**Navenda Nûçeyan**


**RAJIN’ê diyar kir ku jinên têkoşer, ronakbîr û pêşengên şoreşa jinê, Gurbeteli Ersoz û Nagîhan Akarsel li ser şopa heqîqetê bi felsefeya ‘JIN, JIYAN, AZADÎ’ dest bi meşa azadiyê kirin ,bi bawerî û hêviyeke mezin bîrdoziya azadiya jinê xistin meriyetê.**

Ragihandina Azad a Jinê (RAJIN) bi wesîleya Roja Rojnamevaniya Jinên Kurd daxuyaniyek da.

RAJIN di daxuyaniya xwe de diyar kir ku jinên têkoşer, ronakbîr û pêşengên şoreşa jinê, Gurbeteli Ersoz û Nagîhan Akarsel li ser şopa heqîqetê bi felsefeya ‘JIN, JIYAN, AZADÎ’ dest bi meşa azadiyê kirin ,bi bawerî û hêviyeke mezin bîrdoziya azadiya jinê xistin meriyetê. Herwiha da zanîn ku di dîroka azadiya jinê de ew bûn pêşeng, lêgerînvan û dilsozên mezinkirina şoreşa jinê.

RAJIN da xuyakirin ku dewleta Tirk ya qirker çawa ku di 7’ê Cotmeha sala 1997’an de hevrê Gurbeteli şehîd xist, di roja îro de jî bi heman zihniyetê li hemberî gelê Kurd, tevgera azadiyê û bi taybetî jinên pêşeng yên şoreşa azadiya jinê dijminahiya xwe berdewam dike û got: “ Bi palpiştiya hêzên hegemonîk û hevkariya Kurdên xiyanetkar rêbazên herî hovane êrîşên li dijî şoreşger, pêşeng û têkoşerên jinê didomîne.”

RAJIN da zanîn ku têkoşîna heqîqetê ya ji Gurbetan heta Nagîhanan kêlî bi kêlî berdewam dike û mezin dibe û wiha domand: “Em ê, xwedî lê derbikevin. Li ser şopa wan, lêgerîna azadiyê kûr bikin, bi cîhanîna hêviyên jinên berxwedêr tolê ji dewleta Tirk ya faşîst û pergala mêr-dewletê hilînin. Bi felsefeya ‘Jin Jiyan Azadî’ bi bîr û baweriya; wê rastî tu carî di tariyê de nemînin, tekoşîna Gurbeteli, Nagîhan û bi hezaran şopdarên



heqîqetê îro dewrî me kirî bi biryar û îsrarekî mezin heta mîsogerkirina şoreşa jinê bimeşînin.”

# Ehmed Gulo: Wê 2023`yan sala azadiya Rêber Abdullah Ocalan be

Di salvegera 24`an ji komploya li ser Rêber gelê Kurd Abdullah Oclan, welatparêz Ehmed Gulo da zanîn ku wê bi azadiya Rêber Apo her kes azad bibe, bi taybet gelê Kurd wê xewin û xeyalên xwe bi cî bîne.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Ji hezarê salan ve lîstok û plan li ser tekoşin û hebûna kurdan çêdibûn. Beriya komploya li ser Rêber Abdullah Ocalan gelek komployên qirkirinê li ser kurdan dihatin kirin. Herwiha hêzên komploger hewl didan ku hebûna kurdan ji dîrokê rakin. Ji bo wê jî di şexsê Rêber Apo de komplo li ser kurdan û li ser tevayiya gelê bindest pêk anîn. Ev komplo komployeyek navneteweyî bû, ku gelek dewlet tê de hevkar bûn. Heta niha jî komployên li ser kurdan berdewam in. Herwiha
Tevayiya êriş û kiryarên ku li ser gelê herêmê bi taybet li ser jinan tên kirin berdewamiya komployê ne.
Derbarê komploya li ser Rêber Abdullah Ocalan, herwiha berdewamiya komployê ya heta roja îro, welatparêz Ehmed Gulo ji me re axivî.



**`Hewldanên Tirkiyê kurdan ji azadiyê dûr naxe`**

Ehmed gulo da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker roja komployê ji xwe re weke rojeke dîrokî dibînin û axaftina xwe wiha domand: "Roja ku komplo li ser Rêber Apo hat kirin û heta roja me ya îro gelê kurd ranewestiya ye. Rojane gelê kurd û tevayiya gelên li herêmê, li kolanane û banga azadiya fîzîkî ya rêber Abdulllah Ocalan dikin. Ji bo wê ji Tirkiyê çiqasî hewldanên xwe bi kar bîne ew nikare kurdan ji azadiyê dûr bixe. Tiştê ku Tirkiyê berî niha dikir îro nikare bike. Lewra kiryarên wê êdî nayên qebûlkirin û kurd jî ne kurdê berê ne. mesa ber bi azadiyê vey a herî xurt ya kurdan e. Me têkoşîn derbas kiriye êdî emê azadiya xwe û ya Rêberê xwe bi dest bixin. Em gihîştine qonaxa serkeftinê û ji serkevtinê bi paş ve naçin.

**`Êdî tu kes nikare kurdan ji azadiyê vegerîne`**

Ehmed di berdewamiya axaftina xwe de got, Ji ber ku plana komployê bi ser neket û Tirkiyê armanca xwe ya tinekirina kurdan pêk neanî, êdî Tirkiyê nizane ka bi çi awayî kurdan tine bike. Ji ber wê jî niha rojana êrişî kurdan û tevayiya pêkhateyên li herêmê yên ku li kêleka kurdan dixebitin dike. Hewl dide bi rêya êriş û balafirên xwe gelê herêmê yên ku li ser fikir û felsefeya Rêber Apo tev digere, bişkîne û bitirsîne. Lê îradeya gelê me ne bi van kiryaran û ne jî bi şêwazên din nayê şikestin, bi taybet gelê kurd wê heta kêliya dawî li ber xwe bide. Êdî tu kes nikare zoriya xawe li kurdan bike. Yan serkeftin yan jî serkeftin. Ji bilî serkeftinê me tiştekî din nedaye ber çavên xwe.



**`Fikir û felsefeya Rêber Apo hewldanên Tirkiyê vala derdêxe`**

Ehmed Gulo da xuyakirin ku fikir û felsefeya Rêber Apo hewldanên Tirkiyê vala derdixîne û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Raste rêberê gelê kurd di zindanê de tecrîdeke giran li ser tê kirin, lê kurd jî bi fikir û felsefeya rêberê xwe Tirkiyê tengav dike. Rojbiroj hewldanên Tirkiyê yên li hember kurdan lawaz dibin. Şoreşa ku niha em tê de ne jî, bi saya fikir û felsefeya Rêber Ocalan dewam dike û wê bi saya fikrê wî jî bi ser bikeve. Di şoreşê de bi hezarê, bi milyonan şagirtên Rêber Apo çêbûne û tev daxwaza azadiya wî dikin. Herwiha li ser fikrê wî şoreşa xwe bi rêve dibin. Ji bo wê jî şoreşa ku li ser fikrekî rast û dirust bimeşe, helbet wê serkeftî be."

Ehmed bîr xist ku komploya li ser Rêber Apo divkeve sala 24`an û wiha domand: "komploya li ser rêber Apo komloya li ser gelêazadî xwaz bû û azadiya me girêdayî azadiya rêberê me ye. Divê
tevayiya dadgehên cîhanê, li gorî pîvanên parastina mafê mirovan, mafê rêberê me jî bidinê û divê qebûlbikin ku tekoşina rêberê me tekoşina herî pîroz ya mirovahiyê ye. Herwiha divê wî wek Rêberê têkoşîna azadiyê qebûl bikin. Bi azadiya Rêber Apo re wê bi milyonan girtiyên doza azadiyê azad bibin."

**`Ti caran em ji Rêberê xwe qut nabin`**

Ehemed diyar kir ku Rêbertî bandorekî xwe yê mezin li ser civakê heye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dewleta tirk dizwaze gel û rêbertî ji hev qut bike, çimkî baş dizane ku rêbertî hêzeke mezin daye kurdan. Lê ti caran em ji rêberê xwe qut nabin. Rêbertî bandorekî xwe yê mezin li ser civakê heye, bi taybetî civaka kurd. Sekna rêber Apo û zanista ku di nava civaka me de dabû avakirin xwedîderketin û hêza gelê kurd dide xuyakirin. Rêber Apo dibêje, 'eger ez ne hazirbim jî min miletek ava kiriye ku li ser fikir û ramanê min gavên mezin biavêjin'. Ji bo wî jî gel li ser vê yekê têkoşîn dike û li azadiya Rêberê xwe tev digere."
Ehmed da xuyakirin ku wek gelê bakur û rojhilatê Sûriyê ewê zanist û felsefeya ku di wan de hatiye çandin xurttir bikin û got, pêngava azadiyê me hê bi ser nexistiye, ji bow ê jî me rêberê xwe azad nekir, lewma divê em tekoşina azadiyê bi ser bixin. Wê demê wê rêberê me jî azad bibe û wê jiyana me jî ronî bibe.

**`Wê sala 2023`yan bibe sala azadiya Rêber Abdullah Ocalan`**

Welatparêz Ehmed Gulo di dawiya axaftina xwe de got, wê sala 2023`yan bibe sala azadiya Rêber Abdullah Ocalan û serkeftina gelê azadîxwaz. Herwiha bi azadiya Rêber Apo wê her kes xwe azad bibîne, bi taybet gelê kurd û jinên azadixwaz wê xewn û xeyalên xwe bi cî bînin.

# PKK: Em bangê gelê xwe dikin  ku bi têkoşînê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo misoger bikin

**Navenda Nûçeyan**

**PKK'ê diyar kir ku AKP-MHP wê di xwîna ku dirijîne de bifetise û got, em bang gelê xwe dikin ku bi têkoşînê sîstema tecrîd û êşkenceyê ya Îmraliyê ku sembola komployê ye parçe bikin.**


Komîteya Rêveber a PKK'ê bi wesîleya salvegera Komploya 9'ê Cotmehê daxuyaniyek da.

PKK'ê diyar kir ku Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmeha 1998'an ku li dijî Rêber Apo hate kirin, 24 sal in di asta komployê de êrîşên faşîst-qirker dewam dikin û berxwedana herî bi wate ya dîrokê li dijî van êrîşan tê meşandin.
PKK'ê da xuyakirin ku hêzên komploger bi îmhakirina Rêber Apo, bi tasfiyekirina PKK'ê û qirkirina Kurdan re xwestin ku azadiya gelê Kurd û demokratîkbûna Tirkiye û Rojhilata Navîn asteng bikin.

PKK'ê da zanîn ku dagirkerî, komkujî û êrîşkarî çiqasî giran dibe bila bibe, faşîzma AKP-MHP wê di xwîna ku dirijîne de bifetise û di demeke nêz de wê têk biçe, têkçûna wan jî wê li ser bingeha têkoşîna jinê, derbên têkoşîna




jinên Kurd pêk were.
PKK'ê jin a Kurd Ya şoreşger hevrê Nagîhan Akarsel a ku ruh û fikrê azadiyê yê Apoyî bi xurtî pejirand, bi rêz û hezkirin bi bîr anî û bang li gelê xwe û dostên xwe kir ku têkoşîna sala 25'ân li her qadê bimeşînin, bi têkoşînê  sîstema tecrîd û êşkenceyê ya Îmraliyê ku sembola komployê ye parçe bikin û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo misoger bikin."



## Êrîşa dijî Jinê û çima Silêmaniyê?

**Ahmet AKTAŞ**

Êrîşên li dijî jinên Kurdistanî di dema dawî de zêdebûne û wisa xwuya dibe ku wê hîn zêdetir bibin!
Dijminê kurdan berê êrîşên xwe yên qirker; yên ser giştî û taybetî yên li ser jinê, dane Silêmaniyê. Mînaka herî dawî jî şehîdxistina **Nagîhan Akarsel** e(4.10.2022).
Sedemê ku bi taybetî qirkirina jinê kirine armanca xwe, tê zanîn: Ji ber ku êdî pêşengiya jinê ya Şoreşa Kurdistanê, ji aliyê raya giştî ve hatiye pejirandin.
Erê yê ku pêşengiya van êrîşên qirker û hovane hildaye ser milê xwe, dewleta Tirk e, Lê belê yê ev kar jî daye ser milê wê û xistiye destê wê de, hêzên hegemon yên cîhanê ne. Nîşana herî berbiçav jî, bêdengî û bêhilwestiya çapemeniya navdewletî ya li ser van êrîşên qirker yên li dijî jinên Kurdistanê ye.
Ev stratejiya malxerab ya nevdewletî, bi biryara hegemonên cihanî û bi destê MIT'a tirkan ve; di 9.1.2013'an de li Parîsê hate despêkirin. Bi êrîşa di 23.6.2020 de ya şehîdxistina rêveberên Kongra Star re dewam kir û heta niha jî, li gel şehadeta Nagihan Akarsel ve, bi berfirehî didome.
Aliyê vê siyaseta ku, çima li Silêmaniyê êrîş gûrtir bûne; bêgûman girêdana wê ya bi stratejî û siyaseta li dijî Tevgêra Azadiya Kurdistanê re heye.
Vê dijberiyê jî, heta nuha bi hevkariya PDK'ê li Başûr bi giştî dide meşandin. Erê heta niha bi giranî li Hewlêrê û herêmên di bin bandora PDK'ê de, vî karê xiyanetkaran dide meşandin. Lê di vê dema dawî de êdî dixwaze van êrîşên qirker û dagîrker, li herêmên di bin bandora YNK'ê de jî bidin meşandin.
Ma ev mînak ne balkêş e? Di salekê de bi tenê li Silêmaniyê, MIT'a Tirka 5 êrîşên kujerî pêk ani ye! 1-Yasin Bulut û Ferhat Bariş Kondu 2-Ferhat Şiblî 3-Zekî Çelebî 4-Suheyl Xorşîd Ezîz(Mamoste Şemal) 5-Nagîhan Akarsel û li pey hev hatine şehîdxistin.
Îca li vê qonaxê, êdî barekî mezin; him dikeve ser milê Tevgêrên Kurdistanî û gelê Kurdistanê bi giştî, him jî bi taybetî dikeve ser milê YNK'ê.
Li vir, êdî gelek pêwîstiya bangê ji PDKê re namîne, ji ber ku bi salane, li gel bi hezaran bang û reca jê re hate kirin, lê wê hevkariya xwe ya bi dewleta Tirk a dagirker re ne birî.
Hilbet bang û daxwaza taybet û girîng ji YNKê re divê, heke ji vê qonaxê pêve hilwesta xwe ya li dijî qirkerî û dagirkeriya dewleta Tirk re nîşan nede, mixabin dikeve warê hevkariya li gel dewleta Tirk!
Li aliyê din, di kesayetiya Nagîhan û Jîna de, xwedîderketina gelê me û Tevgêra Azadiyê ya li şehîdên şoreşê, her wiha hilwest û berteka wan ya di kesayita Îran û Tirkiyeyê de ya li dijî zordarî, dagirkerî û xiyanetê pir bi rûmet e.
**Bêgûman, divê kes qîma xwe bi van xwepêşandan û çalakiyên hêja ku niha bi berfirehî didomin nîne.**
Him dewletên dagirkerên Kurdistanê û him dewletên hegemon yên cîhanê jî, wê hewl bidin ku rûmet û deskeftiyên şoreşa gelê Kurdistanê û herêmê bixin bin bandora xwe.
Lewma hostayî û hişyarî divê!
5.10.2022



# Koçbera Serê Kaniyê: Em xaka xwe ji dijmin re nahêlin

Li ser salvegera 3'yan ya dagîrkirina bajarê Serê Kaniyê koçbera bi navê Meysa Harûn da zanîn ku rojbiroj hêviya wan ya vegera bajarê wan mezin dibe û got, Serê Kaniyê xaka me ye, em xaka xwe ji dijmin re nahêlin.

**Rojbîn Zagroz/Hesekê**

Di van çend salên dawî de, di encama êrişên dewleta Tirk ya dagîrker û çeteyên wê de li bakur û rojhilatê Sûriyê gelek dever hatin dagîrkirin. 9`ê cotmeha 2019'an jî ji ber êrîş û dagîrkeriya dewleta tirkî, bi hezaran xelkên Serê Kaniyê ji bajar, mal û milkên xwe dûr ketin. Herwiha ev roj ji bo xelkên Serê Kaniyê rojeke reş û pir bi êş bû.
Di salvegera 3'emîn ya dagîrkirina bajarê Serê Kaniyê, koçbera bi navê Meysa Harûn ya ku li kampa Waşûkanî dimîne ji me re behsa kêliyên derketina wan ji bajarê wan kir.



**`Dewleta tirk çekên kîmyawî li ser me barandin`**

Meysa Harûn da zanîn ku 3 sal di ser koçberiya wan ya ji ber dagîrkirina dewleta tirk re derbas dibe, lê hê jî ew kêlî ji bîr nekirîne û axaftina xwe wiha domand: "Di 9`ê vê heyvê de em 3 salan ji çîroka xwe ya bi êş derbas dikin û dikevin sala çaran de. Em her kêlî, roj û saetên dûrbûna ji bajarê xwe dihejmêrin."

Meysa behsa roja koçberiyê û derketina ji bajarê xwe kir û wiha got: "Di 9`ê Cotmeha 2019`an de ku bajarê Serê Kaniyê di Ewlehî û aramiyê de bû û her kes li ser karê xwe bû, dewleta Tirkî ya dagîrker di kêliyên piştî nîvro de êrişî me kir û felaketeke bi ser gelê bajêr de anî. Wê demê Tirkiyê balafir û çekên kîmyawî bi ser me de rijandin. Çend saetên destpêkê de me hewl da ku em li ber xwe bidin, lê ji ber topên bi balafirian me pêşiya xwe nedidît. Ji ber wê jî em naçar man ku ji bajarê xwe derkevin."

**'Tu sucê dij mirovahî neman ku dewleta tirk nekirîn'**

Meysa got, dewleta dijminê gelan ya qirker me bi darê zorê ji malên me de derxist û niha jî malbatên çeteyan li şûna me bi cih kirine. Em li kampan di binê konan de jiyan dikin û malên me jî ji çeteyên Tirkiyê re mayîne. Di van 3 salan de jî ti kiryarên terorî ne man ku dewleta tirkî li bajarê me, li ser gelê ku negihîştî bireve nekirî. Ev bûyer û kiryar li ber çavê tevayiya cîhanê tê kirin û heya niha jî kesî dengê xwe nekiriye. Qaşo hin saziyên navnetewî dibêjin em parastina mafê mirova dikin, kanê parastina mafê mirovan. Mijar dema dibe kurd mafê mirovan tê jibîrkirin gelo! Ma me çi



ji Tirkiyê kiribû, heta ku bajarê me dagîr kir. Me doza mafê xwe kiriye, me êrişî Tirkiyê nekiriye."

**`Wê rojek serkeftin ya me be`**

Meysa bal kişand ser êrişên Tirkiyê û wiha pê da çû: "Tirkiyê êriş dike da ku hêza me bişkîne, lê hêza me nayê şkestin û wê rojek serketin ya me be. Wê rojek were emê vegerin bajarê xwe û azad bijîn. Çiqas em êşê dikşînin ewqas hêz û îradeya me xurttir dibe. Ev jî ji dewleta dagîrker re bibe dert. Serê Kaniyê xaka me ye, em xaka xwe ji dijmin re nahêlin."

**`Wê berxwedana me berdewam be`**

Meysa Harûn di dawiya axaftina xwe de got, heta ku diranek di devê me de hebe emê bêjin;  `emê vegerin` rojbiroj hêviyên me mezin dibin.

# `Bexwedana gelê şoreşger, teqezkirina serkeftina şoreşê ye`

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

**Xerîb Hiso: Ji bo mirov şoreşa xwe biparêze divê destpêkê mirov nirx û îradeya şoreşa xwe bizanibe, ev jî ji rihê welatparêziyê tê. Hezkirina netew, ax, civak, xeta parastinê û nirxê şoreşê, dihêle mirov li şoreşa xwe xwedî derkeve.**

Li ser Şerê Gel yê Şoreşgerî, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî wiha gotiye: "Divê gelên herêmê li gorî stratejiya nû (Şerê Gel yê Şoreşgerî) xwe birêxistin bikin û xwe biparêzin, sûdê ji şaştî û tecrûbeyên berê bigirin."
Li ser mijarê Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Xerêb Hiso, ji rojnameya me re axivîn.

**`Bi rihê welatparêziyê li şoreşê xwedî derkevin`**

Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Xerêb Hiso li ser rê û rêbazên Şerê Gelê Şoreşgerî wiha nirxand: "Ji bo mirov şoreşa xwe biparêze divê destpêkê mirov nirx û îradeya şoreşa xwe bizanibe, ev jî ji rihê welatparêziyê tê. Hezkirina netew, ax, civak, heskirina xeta parastinê û nirxê şoreşê, dihêle mirov li şoreşa xwe xwedî derkeve. Li dijî zilm û zuhniyeta faşizmê civak radibin ser piya û şoreş bi vî şêvazî tên li dar xistin. Li gelek welatan şoreş wisa çêbû ye. Bi taybetî civaka me ku ev deh salin di nava şoreşê de jiyan dikin, bi berdêlin biha û mezin heta niha gev bi gav tê meşandinîne. Bandora raman, proje, çand û felsefeya civaka me restiya vê şoreşê ji cîhanê re da diyarkirin."

Xerîb got, divê gelê me têbigihêje ku em di nav şoreşke pir mezin de ne. Herwiha divê bizane ku em pêvajoyê hebûn û tinebûnê dijîn û tine xurtkirina têkoşînê  û parastina fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, serketina şoreşê wê mîsoger bike.

**`Hêzên serdest tinebûna xwe di rêxistinkirina gelê şoreşger de dibînin`**

Xerîb Hiso li ser şerê taybet yê ku hêzên serdest ji bo berjewndiyê xwe li dijî gel bi kar tîne jî, wiha got; "Hêzên serdest li dijî gelê şoreşgerî planan çêdikin, lewra ew tinebûna xwe di rêxistinkirina gel de dibînin. Mîna dewleta tirk ya dagîrker ku siyaseta xwe ya qirêj, bi hemû hêza xwe re dixe nava liv û armanca wê ya yekê jî şkandina vîna gelan e. Dixwaze bajaran vala bike û gel ji şoreşê dûr bixe. Ji bo wê jî dewleta tirk û hevalbendên wê, deriyê xwe ji koçberan re vedike."

Hiso wiha dirêjî da axaftina xwe: "Şerê gel yê şoreşgerî, ne tenê çek e; fikir, îrade û rêxistin e. Şerê gelê şoreşgerî de, hemû beşên jiyanê di hindirê xwe de dihewîne. Yek jî jê hêza parastinê, rêxistina civakê, hêza cewherî ya ji gund heta bajaran e. Li ser van hêmanan, weke sîstemeke xwe ava dike û dijmin têk dibe. Ji vê re dibêjin Şerê Gel yê Şoreşgerî. Divê civak li ser van bingehan xwe birêxistin bike û bibe nûnerê cewherê şoreşa xwe. "

**`Ji bo gel ji şoreşê dûrbixwe, riya koçberiyê hêsan dikin`**

Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk



(TEV-DEM) Xerêb Hiso, li ser erka gel ya di vê pêvajoyî de axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Tişta herî girîng û pêwîst xurtkirina têkoşînê ye. Divê gelê me ji hêza xwe bawer be, bi taybetî divê li hember êrişên dagirkeriyê piştgiriya hêzên xwe yên leşkerî bike. Herwiha divê derfetê nede dijmin ku di navberan gelen de dijberiyê çêke, divê gelê me danûstandina xwe bi tevayîya pêkhateyan re xurttir bike. Baweriya me jî bi gelê me heye, li ser vê baweriyê kar û xebat tê meşandin. Îro em jî di nav dewletên navneteweyî de, weke hêzeke sereke û xwedî îrade têne naskirin. Ev jî bi saya fikir û felsefeya Rêbertiyê û xwîna şehîdên me ye ku wê serkeftin jî para me be. Lewra banga min ji gel re ewe ku hê zêdetir li ber xwe bide û li xwîna şehîdan xwedî derkeve."

FENER



## Kî Bi Ser Ket Û Kî Bi Bin Ket?

**Idrîs HENAN**

Di Gulana 1996'an de, dewleta faşîst a Tirk ku kirîz û kaosên mezin li hundir û derve jiyan dikir, hewl da bi tunekirina sentez û modela gelan a demokrasî û azadiyê, pêşeng û afrînerê wê tune bike.
Li ser vê bingeha hişmendiya qirker, bi rêya istixbarata xwe û hinek ajan û xwefiroşan, li Şamê cihê ku Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan lê dima, êrişek mezin pêk anî. Lê di encamê de tişta ku wan hêvî dikir pêk nehat û êriş vala derket.
Piştî ku ew plan jî têk diçe, dewleta tirk sala 1997'an, berê xwe dide girtiyên PKK'ê û ji bo agirbestekê lavayan dike û hevdîtinan li ser hev pê re dike. Ev diyaloga rayedarên Tirk bi berpirsên rêxistinê re berfireh dibin û bi destpêka sala 1998'an re li Holandayê dewam dikin. Ji ber ku tevgera Azadiyê li ser bingeha aşîtî û pêkve jiyanê hatiye damezirandin, bi destpêka Îlona 1998'an re, Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan, bi rêya ekranên MED TV re, agirbestê radigihîne. Çend roj di ser re derbas nabin, generalê Tirk Atilla Ateş diçe ser sînorê Sûriyê û dibêje "Eger Ocalan ji Sûriyê dernekeve, em ê êriş bikin".
Rêber Ocalan armanca vê plana qirêj ya faşîzma Tirk baş fêm dike. Ji bo ku Sûriyê û gelên wê herêmê û nirxên wê, ji hovîtiyeke muhtemel a faşîzma Tirk biparêze û hîncetên şerekî herêmî, bi sernavê qirkirinê ji holê rake, di 9 Cotmeha 1998'an de ji Sûriyê û Rojhilata Navîn derdikeve. Di wê navberê de, Rêber Apo weke gokeke agir li dunyayê mezin dibe û ramanên wî weke fena agirê bi pembûyê ketibe, berbelav dibin. Êdî kesek nediwêre nêzî goka agirê heqîqetê bibe.
Lewre, hemû aliyên qaşo xwe xwedî çand dihesibînin, xiyanetê bi dîrok û nirxên xwe re dikin û mirovahiyê di şexsê Rêber Apo de, rû bi rûyî êrişên komplowar dihêlin.
Di serî de Yunanîstan, tevahî welatên YE û Rûsya, hemûyan îxanet li nirxên mirovatiyek birûmet û gelên xwe kirin. Ji ber ku bineya avaniya wan a modernîta kapîtal, bi sîstema netew dewlet xemilandiye, wêrekiya wan nîn bû ku xwedî li ramanên Rêber Apo derkevin. Ne rastgir û ne jî çepgir, radîkalên herdu aliyan jî di nav de; nikarîn ramanên Rêber Apo hembêz bikin û biparêzin. Lewra, piştî çend meh di ser zextên gladyoya modernîteyê re derbas dibin, di 15 Sibata 1999'an de, Rêber Apo li balyozxaneya Yonanîstanê li paytexta Kenya-Neyrûbî, bi serperştiya saziyên istixbarata Amerîka, Îsraîl û Ingiltire tê revandin û li Îmaraliyê di bin venerîna faşîzma Tirk de dîl tê girtin.
Îro 24 sal di ser vê Komploya Navnetewyî re derbas dibin. Hîna jî bi teşe û şêweyên cuda cuda dewam dike. Li Rojava bi êrişên li Şoreşa gelan ya 19 Tîrmehê, li Bakur bi êrişên li rêveberiyên xwecihî, li Başûr jî bi êrişên li ser Herêmên Parastina Medya, bajar û gundan dewam dike. Li Rojhilatê Kurdistanê jî êrişî pêşengiya têkoşîna rizgarkirina Rêber Apo dikin û bi mayîndekirina qirkirina jinê re, hewl didin komployê zindî bihêlin.
Lê berxwedan û senteza ku Rêber Apo afirandiye baş diyar dikin kî bi ser ketiye û kî jî bi bin ketiye? têkoşîn, berxwedan, ramanên sînorên cografîk derbas kirine, serketina vîna afrîner a Rêbar Apo baş rave dikin. Di heman demê de binkeftina komplogeran jî diteyisîne ku carek din anîne asta lava û ricakirinê.